

Jîn

Xwê u Runahî



Xwê. Xwê bu xoşkirna tamê u parêztina xwarinê tête bi kar înan. Heker xwarin çêkir xwê ji bîr bikit, xwarin bê tam e.


Xwê jî tişt parêz dicit; xwarnê ji genîatîê diparêzit. Ji berî kehreb u selace hebin, pîrêt we xwarin bi xwê parêzîtin. Wan qelî u spil çêdikirin, u ew xwarine gelek heyva man u genî ne dibî. Hêta ku me selace u micemîde hene, belê em her xwê bi kar tînin bu gelek tişte wekî tîrşîê, sîrkî, keşkê, ava temata u penîrî.

Runahî. Runahî di tarîê re diçit u em dişêin bibînîn. Her dem runahî ji tavê u heyvê u stêra têt. Belê, di şikefta ve her tarî ye u runahî nîne.

Diz dizîa xu bi şevê dikin çunku bi şev tarî ye u runahî kême u kes nabînit da wan rawestînin u bigirin.

Jiberî dû sala hevala min (X-) xewnek dît u behsa xewna xu bu min kir. Xewna wê husa bî:

Tarîek mezin dît, u ew tîrrsa. Dîv da runahîek bi meznatî dît, u ew pitir tîrrsa.



Piştî hingê xanîek bîanî dît u çar şemalk dihilkirî tê da bîn. Hevala min gelek heş runahîê şemalka kir u bi rê ve çû def wan.

Tu çî dibêjî? Mebesta xewna wê çî ye? Min eve gutê. Tarîa mezin Kurdistan e. (Min şîa bêjim ew tarîa mezin Emrîke ye yan behirek dî li cîhanê ye, bes mala wê li Kurdistanê ye.) Gelek tarî li Kurdistanê yê hey, wekî drewkîrnê u gutinê ne rast u gendelîê u hîlekîrnê. Runahîek bi mezinatîa Xwidê ye, ku pîruz u dilpaqij u mezin u bi tirs e.

Xanîek bîanî u çar şemalk tê da xanîa min u sê hevalê min li Dihukê bî ku (X-) hêş ne dîtî bî u ji ber hindê ew xanî bîanî bî bu wê. (Mîrîem, Emîre, Kêtî u ez pêk ve li xanîek li Dihukê jîan demê me dersê Inglîzî havîna 2004 dan.) Ez u hevalê min bawerîa ‘Îsaî dikîn. ‘Îsa gut şagirdêtu ku ew “runahîa cîhanê” ne, ye’ nî ew wêne u runahîa mezinatî ya Xwidê ne.

Heker kesek “runahî” ye, karê wî harî karîa miruv (yêt li tarîê dijîn) da bibînin u gendelîê pêşçav bikit.

Ji ber hindê heker em Xwidê tirs înan, pêtivî ye em wek xwê u runahî li komela xu da bîn. Pêtivî ye jîana me bi axiftin u karê baş bête kîrnê da komela xu ji şulê piçkîrnê parêzînan. U pêtivî ye miruv bişên çav li başîê u dilpaqijîê bikin. Bi taybetî bi komela Kurda ya gelek zî tête gihurîne, pêtivî ye em bimînîn bi qowet u bi rastî u qencî u paqijî. Ev kare bu me heker em ji Xwidê bitîrsîn u ne hêlîn ser milê êke dî.

“Hîn xwê ya ‘erdê ne. Belê heker xwê sîratîa xu ber da, çawa dê careka dî sîr bite ve? Êdî bi kêr çî naêt u pavêjine ji der ve da xelik pê lê bikin! Hîn runahîa cîhanê ne. Bajêrekê li ser çîaî avakîrî naête veşartin. Xelik çîraî hîlnakin u bînxêvin, belê di danite cihekê bilind da runahîê bidite hemî kesê di malê ve. Bila bi vî rengî runahîa we beramberî xelkî run kit, da karê we yêt çak bibînin u Babê we yê li esmana bi rumet bikin.”

- ‘Îsa (Mizgînîa Mettî 5:13-16)

Azadîa rastî çî ye?

Babê min miruvekî “xwê” u “runahî” ye. Her dem ew hêş Xwidê dîkî u xizmeta xelkê daî ye. Ew guhê xu didite fermanê Xwidê u wan nîşa me (biçîkê wî). Jîan u peyvê wî nîşa me dit çî li dilê wî bî. Rojekê wextê ew dimirit u diçite bihêşta Xwidê, Çêkir u Dadkarê wî dê bêjit wî: “Te karek baş kirî ye, ey xulamê qenc.”

Di demê nivîsandina vê jimara “Jîn”, tengavîek bu mala min çê bî: ji nişke kê ve u gelek zî sehetê babê min xirab bî. Dest u pê wî yê rastê niv şelelê girtin u axiftina wî u hizira wî ne zelal bîn. Me gut belkî celta mejî heye u me bawer kir ew hêş dê nexuştir bit. Temenê babê min 69 sal e, bes tebî’î gelek bi qowet bî u zîrek bî u sehetê wî baş bî. Li wî demê wî ne şîa timbêlê bihajut, ne şîa şul bikit u ne şîa baş biaxivit. Wî ne şîa xizmeta xelkê bikit; belê miruvê wî u hevalê wî pêtivî bîn xizmeta wî bikin. Çunku behira pitir ji azadîa wî ne ma.

Deyk u babê min çûn def rêberê dêra xu. Rêbera du’ a bu qencbûna babê min bi navê Dixturê Mezin (Îsaê Mesîhî) kir.

Dumahîkê deyka min babê min bir xestê u dixtura brîar dan ‘emeliata mejî bu babê min bikin. We dîar e ji berî dû heyva bi xeletî ve li tiştêkê req hîl li serê xu da u di jur ve birrî hîta xwîn deh ji seda mejîê wî girêda. U ji ber hindê dest u pê wî yê rastê şelelê girtin u axiftina wî ne zelal bî. Nuke em supasîa Xwidê dikîn, ‘emeliat serkeft u babê min

qenc bî. U wextê ji pencê rabî, yarî gel sister u mizemida kir!☺

Ewilî min u mala xu bawer dikir babê min dê mirit yan da bi sehetê xirab jît. Belê me bu wî du’ a kir u bi çakî u diluvani ya Xwidê u bi destê dixtura, Xwidê dîarîet sehetê baş u azadîê da babê min ve.☺ U demê nêzikî ew carek dî dê şet xizmeta miruva bikit u karê xu bikit u bizava xu bizivirrite ve.

Jîana te wek zirufîê ya babê min e. Li sala 1991 dîarîa azadîa sîasetê bu we hate dan u hîta nuke hîn di wê azadîê dane. Hîn sîstema zanînê yê digihurin. We internet u mobayl înan bajêr u gundê xu. Xwendikarê we çûn derveî welatî da bixwînin. Hindek ji malê we yan miruvê we mihacir bîn derveî welatî u tama dîmokrasiya welatê Rojava kir. Belê, hindek ji we cinsîet wan welata bu xu wergirtin.

Hîn azadîê bi çend şikila hatin dan. Ka em bi wê azadîa Xwidê daî me çawa kar pê tînin? Bu armanceka baş, anjî armanceka xirab?

Bîne bîra xu:

“Ew kesê gelek wergirtî dê gelek jê ête xwastin, belê yê gelek zîrek u wergirtî li def bite danan dê pitir jê ête xwastin.” - Îsa (Mizgînîa Luqâ 12:48b)

**Hêçî guhê xu ne dit qesê mezina,
dê lê ên şaxê bizina.**

- gutineka Kurdîe

Çîroka Deh Xulama

Miruvek ji maleka xanedan çû bajêrekê dîr daku xu bi miranîê wergirit u vegerrête ve. Îna gazî kir her deh xulamêt xu, u deh wezine [parêt asin yêt wî demî] deynan def wan u gut: “Karê bazirganî pê bikin heta ez bihêm.”

Belê xelkê bajêrê wî serê wî ne divîan, îna hindêk li dîv da virêkirin, daku bêjinê me ne vêt ev miruve bibîte paşa li ser me.

U demê vegeftaî u piştî paşayetî wergirtî, fermana her

deh xulama da, ewêt deh wezine daîne wan, daku bizanît ka her êk ji wan çi ji bazirganî ya xu anînber kirî ye.

Yê êkê hat u gut, “Ey xudan, wezina te deh wezine anînber kir.”

Îna gutê, “Te karek baş kirî ye, ey xulamê qenc. Vêca çunku tu li ser piçekê destpak bûî, here bibe walîê deh bajêra.”

U yê dûê hat u gut, “Ey xudan, wezina te pênc wezine anînber kir.”

Îna ev çende gute wî jî, “Bibe walîê pênc bajêra.”

Paşî xulamê dî hat u gut, “Ey xudan, eve wezina te ye, ya ku min dinav dersukê da veşart. Ez ji te ditirsam, çunku tu miruvekê dîlreq î. Tu wî tiştî dibî ewê te ne danayî. U tu wî tiştê didrî ewê te ne çandî.”

Îna gut, “Ji ber devê te ez dê te dadkim, ey xulamê xirab: Te dizanî ez miruvekî dîlreq im, ez wî dibim yê min ne danayî. U wî tiştî didirîm yê min ne

çandî. Pa te buçî parêt min ne kirin di panqê da demê ez dihatim da anînberê jê bikim?”

U paşî gut ewêt li wêrê rawestaî: “Wezinê jê bistînin u bidine xudanî deh wezina.”

Îna gutinê: “Ey xudan, ewî deh wezinê heyn.”

Îna gut, “Ez dibêjime we ewê hey dê hêş bu ête danê. U ewê çi ne bît hetayê hey jî dê jê ête standin. U dujminê min ewêt ne divîan ez li ser wan bibim paşa, li vêrê bu min hazir kin u li ber çavê min ser jê kin.”

- ‘Îsa (Mizgînîa Luqaî 19:12-27)



Îmêlêt We

✉ Silav bu te, xuşka hêja.

Ez hîvîa lê burîne ji te dikem çunku min di we nasîna çênebî te kir çunku min “attachment” ne xwand. Li piştî min xwandî, min tu naskirî u ez hîvîa serkeftinê bu te u rujnama te “Jîn” dikem. U ez amade me ji bu belavekirna vê karê pîroz. U di xizmetê da me bu her karekî we bivêt.

Biraê te,

I.X.E.

✉ Gelek supas. Namek zor can bî.

A.Y.

✉ Baş e ser çava. Ez dê “Jîn” bu hevalên xu virêkim. Erê guvara “Jîn” çend roja derdikevit? U guvarek taybete bi zimanê ve yan ser gelek tiştê diaxivit? Supas.

N.T.

✉ Çawan î mamosta ya hêja. Ez rêz u silavêt xu dîyarî te dikem.

Mamosta, ez pir ji dil lê burînê ji te dixazim çunku min nezanî ew name ya ji def te hatî. Min hizir kir ya bi xeletî ve ji def kesekê dî hatî.

Ez pîroz bahîya te dikim bu guvara “Jîn”; ez serkeftinê bu te u bu “Jîn” dixazim.

Xwidê digel te bit,

N.M.S.

✉ Ev dema te xweş be Şîrîn Xanim.

Min wan keresteyên fêrkariyê, yên ku we amade kiribû xwandin. Ez pir dilxweş bûm ji ber wê hindê, ku jinek Kurd bi vî karî rabûye û vî karê pîroz amade kirî ye. Destê we xweş be!

Her bimînin şad û bextiyar û di gel silavên gerim û gurr!!!

Birayê we,

G.C.

✉ Silav u rêz xoşka Şîrîn. Li despêkê pîrozbahî ya te dikem bi helkeftina derkeftina guvara “Jîn” u dest xuş, karekê cuane. Her serkeftî bî; silavêt taybet bu mamosta min Emîra (Beth) u Mişêl (Michelle).

Supas bu hewe,

Birayê te,

S.

Berîkana Wênêkêşanê

Tu dişê wênê dirist bikî bi qelemê reş yan heker te êk hebit bu me îmêl bike: jeenuazadi@cs.com. U pêtvî ye gehet di destê me ne drêngtir ji 25ê mehê.

Êk ji van babeta hilbijêre:

- çîrokê li ser ma li perra êkê
- ‘edet u keltur yêt Kurdî yêt kevin
- ‘edet u keltur yêt Kurdî yêt nî

Em dê sehkînê wan wêna u dê brîarê dîn ka kîşk wêna êkê ye, yê dûê ye, u yê sîê ye, u dê ew wêne belav kirin li guvarê da.

Dîtina Peyvêt Kurdî

Tu zanî ez Emrîkî me. Bu min Behdînî zimanekê bîanî ye. U ez zimanê ‘Erebî nizanîm. Demê ez Behdînî fêr bîm (1992-1993), di axiftina we da hindek peyvêt ‘Erebî hebîn. Nuke me divêt bê peyvêt ‘Erebî biaxivîn u binvîsîn.

Vêca heker te divêt harî karîa min bikî da ez peyvêt Kurdî dirist bizanîm, zehmet ne bit îmêlekê bu min virêke **jeenuazadi@cs.com** u peyvêt Kurdî bu min binvîse. U ristekê jî binvîse da ez baş tê bigehim.

[(Ar) = Arabic / ‘Erebî; (K) = Behdini Kurdish / Behdînî; (f) = feminine noun; (m) = masculine noun]

Bu nimûne: **car** seyare (f) (Ar) (seyara min *my car*)

Heker tu peyvekê Kurdî ya dirist bizanî, îmêlekê bu min virêke u husa binvîse. (Heker tu ne şêî nimûnekê bi Inglîzî binvîsî, çi nîne. Nimûnekê bi Behdînî pêtivîtir e.)

car = seyare (f) (Ar) = timbêl (K)
 timbêl (Timbêla min kesik e. *My car is green.*)

Supas bu harî karîa we!

Demê tu îmêla min dikî, zehmet ç = c,
ne bit bi pîtêt Kurdî NE nivîse ş = s,
çunku wextê digehite kîmputera ê = e^
min, پیتت کردی digehin **ÆIÎIÇ** î = i^
u ez ne şêm bixwînim. ħ = h^
Çêtir e pîtêt taybetî husa binvîsî: x̄ = x^

about (1) teqîrîben (teqîrîben se’et ħeft *about 7:00*)
 (2) tê heye (tê heye se’et şeş *about 6:00*)

abroad xaric (Ar) (Ezê çim xaric. *I’ll go abroad.*)

apparently ekîd (Ar) (Seyara wê de’mî, bes ekîd çi li wê ne hati ye. *She had a car accident, but apparently she wasn’t hurt.*)

bag ‘elaqe (m) (Ar) (Ev ‘elaqe neylon e. *This bag is plastic.*)

baker (1) xebas (Ar) (m/f)
 (2) firneçî (Ar) (m/f)

Some of the following information was taken from www.m-w.com/dictionary.


































already (prior to a specified or implied past, present, or future time; by this time; synonym: PREVIOUSLY)
 (He had **already** left when I called.)

challenge
 (Our new **challenge** is Behdini education.)

bless (1) to invoke divine care for
 (**Bless** your heart.)
 (2a) synonym: PRAISE, GLORIFY
 (**Bless** God’s holy name.)
 (2b) to speak well of; synonym: APPROVE
 (Fatima wants her father to **bless** her marriage to Ahmed.)
 (3) to confer prosperity or happiness upon another person
 (My grandfather **blessed** me by buying me a new car.)
 (4) synonyms: ENDOW, FAVOR
 (Nizar has been **blessed** with athletic ability; he’s an excellent soccer player.)

curse (a prayer or invocation for harm or injury to come upon someone; synonym: IMPRECATION)
 (1) when God says it
 (**Cursed** is X— because of his disobedience and sin.)
 (2) when a person does it to another person
 (X— is a very unkind man and will **curse** you if you offend him.)
 (3) when a person says it to God
 (Job’s wife told Job to **curse** God when he was afflicted with horrible pain.)

Elif Bê

'	‘Îraq		I, I	Istralîe		S, s	sister	
A, a	agir		Î, î	îprax		Ş, ş	şeh	
B, b	berx		J, j	jijî		T, t	temate	
C, c	camî'		K, k	kiras		U, u	Urdin	
Ç, ç	çav		L, l	leymîn		Û, û	ûtêl	
D, d	dersuk		M, m	meymînk		V, v	vexwarin	
E, e	enişk		N, n	nubedar		W, w	werîs	
Ê, ê	êxtîar		O, o	ode		X, x	xîar	
F, f	fêqî		P, p	paîsigil		Û, Û	Ûarîfk	
G, g	gul		Q, q	qelew		Y, y	Yunan	
H, h	heyv		R, r	rîvî		Z, z	zirnna	
Û, û	Ûêştir	